Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1083 | 19-Tîrmeh- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# ‘Gava şitil mezin dibin li Mîhrîcana Uruguay xelat wergirt

**Fîlmê “Gava şitil mezin dibin” xelata baştirîn fîlmê dirêj di Mîhrîcana Fîlman a Montevideo ya Navneteweyî li Uruguay de wergirt.**

Fîlmê ku dema wê saeteke û 23 deqe ye, ji aliyê Komîna Fîlm a Rojava ve hatiye amadekirin. Sînemager Rêger Azad Kaya bi kordîneya her du derhêneran; Deniz Derya û Mihemed Emîn Engîzek senaroyaya fîlmê nivîsiye û derhêneriya wê kiriye. Film li Kobanê di havîna 2019`an de hatiye kişandin. Çîroka wê li ser firoşkarekî mast ê bi navê Hisên û kuça wî Zelal li Kobanê dijîn û di rê de rastî zarokekî bi navê Hemûdê yê li mala xwe digere, tên. Di rêwîtiya wan a rojekê de gelek zehmetiyan dibînin. Di fîlmê de rastiya civaka û nasandina sînemageriya kurdî ye.”

### Astengıyên li pêşiya fîlmê

Der barê astengiyên li pêşiya fîlmê derketine Kaya got: “Di kişandina film de me gelek zehmetî kişandin. Lê çoşa şoreşê, me ji vê yekê bêpar kir. Hemwextî kişandina fîlmê, dewleta Tirk a dagirker êriş Girê Spî û Serêkaniyê kir. Lê dîsa bi qasî em dikarin me bilez film kişand, rast e demekê rawestiya lê piştî êrişan film derbasî qonaxa prodaksiyonê bû.”

### Pêşandana fîlmê

Kaya wiha domand: “Nêrînên sînemageran û derhênerên cîhanî, bi giştî erênî bûn. Vê piştgirî da me.”



nû ya piştî şerê Kobanê ava bûye tê ravekirin.

Derhênerê fîlmê sînemager Rêger Azad Kaya ji ajansa me re axivî. Kaya got: “Fîlm, havîna 2019`an hate kişandin. Xebatên kişandina fîlmê dirêj nekir. Li gorî standardên sînemayê yên cîhanî, amûrên kişandinê ne têrker bûn. Lê armanca me ew bû ku em balê bikişînin ser mijara fîlmê û karê komî.”

Kaya wiha behsa kesayetên filmê kir: “Ew ji Kobanê ne. Tu tecrubeya wan ên lîstikvaniyiê tune ne. Malbat tev li şerê Kobanê bû. Her du zarok jî xwişk û bira ne. Bavê wan di şerê Şêxmeqsûd de sala 2016`an jiyana xwe ji dest daye.”

### Fîlm di 10 mîhrîcanên cîhanî de hate pêşandan

Kaya destnîşan kir ku fîlmê “Gava şitil mezin dibe” di 10 mîhrîcanên cîhanî de hatiye pêşandan û got:“Ji nav wan Mîhrîcana Fîlman a Meksîko, Mîhrîcana Fîlman a Navneteweyî ya Montevideo, festîvalek li Japonya, Kolombiya, Katalonya û Swêdê, ji bilî hin festîvalên kurdî, ku ya dawî Mîhrîcana Montevideo li Uruguay bû. Di vê mîhrîcanê de, me xelata baştirîn fîlmê dirêj wergirt. Ev yek ji berhemên şoreşê ye. Armanca wê, ragihandina rastiya şoreşa Rojava ye

Fîlmê “Gava şitil mezin dibin” cara yekemîn li Kobanê û di Mîhrîcana Fîlman a Meksîko de hate pêşandan. Têkildarî wê Kaya got: “Me film diyarî tevahî zarokan kir ku di êrişên dewleta Tirk a dagirker de jiyana xwe ji dest dane, yên ku di şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê de sêwî bûne, kir. Fîlm li gundên Zapatîsta yên Meksîkayê jî hat pêşandan û vê yekê coşeke mezin da me.”

Di dawiyê de Kaya got:“Sînemagerî li Kurdistanê hêdî hêdî bi pêş dikeve. Ev pêşketin li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, zelaltir e. Em hêvî dikin ku xebatên din ên hunerî çêkin.”

Sînemaya Kurdî li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tevî astengî û zehmetiyên li pêşiya şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê derdikevin, li gorî rêgeza berxwedan û têkoşînê bi pêş ket

### Rêger Azad Kaya kî ye?

Kaya li eyaleta Agirî ya Bakurê Kurdistanê ji dayîk bûye. Sînema li Zanîngeha Antalyayê xwendiye. Sala 2013`an dest bi çêkirina fîlman kir. Gelek belgefîlm ji bo kanalên telefizyonê kişandine. Di gelek fîlman de cih girt mîna “Ji bo azadiyê” û di gelek kurtefîlman de, wek sînemager û montajker, di fîlmê Kobanê de jî derhênertiya lîstikvanî kiriye hem jî wekî lîstikvan cihê xwe tê de girtiye.

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# ŞOREŞA ROJAVA ŞOREŞA JIN Û JIYANÊ YE




Sudoku: Bersiv 92

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 4 | 2 | 3 | 8 | 7 | 6 | 9 | 5 | 1 |
| 7 | 8 | 6 | 9 | 5 | 1 | 4 | 2 | 3 |
| 5 | 1 | 9 | 2 | 3 | 4 | 8 | 7 | 6 |
| 6 | 3 | 1 | 5 | 4 | 8 | 2 | 9 | 7 |
| 2 | 7 | 4 | 3 | 6 | 9 | 1 | 8 | 5 |
| 8 | 9 | 5 | 1 | 2 | 7 | 3 | 6 | 4 |
| 3 | 6 | 7 | 4 | 8 | 2 | 5 | 1 | 9 |
| 9 | 4 | 2 | 7 | 1 | 5 | 6 | 3 | 8 |
| 1 | 5 | 8 | 6 | 9 | 3 | 7 | 4 | 2 |

Sudoku:Pirs 93

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 4 | 2 | | 6 | | | | |
| 3 | | 1 | | | | | | |
| | 7 | | 5 | | | | 2 | 9 |
| 9 | | | 6 | 7 | | | | |
| 2 | | 7 | 1 | 8 | 9 | 3 | | 4 |
| | | | | 5 | 2 | | | 8 |
| 1 | 2 | | | | 3 | | 4 | |
| | | | | | | 2 | | 3 |
| | | | | 4 | | 7 | 5 | |

# FERHENGA BIWÊJAN

## Biwêj çi ye?

Biwêj, ji hevokekê, yan çend hevokên wisa pêk tê ku bi giranî, ne li ser wateya xwe ye û balkêş e. Mînak: Ava min û wî di coyekê de derbas nabe. Ji bo kesên ku bi hev nakin tê gotin. Avê dicû. Ji bo kesê pir hêrs bûyî tê gotin. Av li xwe negerand. Ji bo kesê li hemberî neheqiyê xwe bêdeng dike, bêxîretiyê dike tê gotin.

**Biwêj çawa ketine jiyana gelan**

Bêguman, dîroka biwêjan jî hinge dîroka ziman, kevnar, balkêş û rengîn e. Ji ber ku biwêj gotinên palandî, honayî, xwedîcewher û bibandor in, mijareke pisporiyê ye. Çawa ku ziman di nava demê de li gorî pêdiviyan derketine û pêş ketine, biwêj jî hem li gorî pêdiviyan derketine, hem ji ber xwe û bêwate nehatine çêkirin; bi piranî bûyer qewimîne û li gorî wan bûyeran derketine. Heta gelek ji wan, çîrokên wan jî hene. Mînak: Bû xwîna Siyahoş. Piştî ku Siyahoş tê kuştin û ji bo xwîna wî bi salan mirov tên kuştin, nû ev gotin dibe biwêj. Berûya qûna bizinê ye. Mirovek, ji bo ku bizina wî qelew bibe, berûyan dixe qûna wê. Ev kiryara wî bûye sedem ku ev biwêj derketiye. Lê mixabin pir hindik çîrokên wan tên zanîn.

Xaleke din ya girîng ew e ku hin biwêj li seranserê welêt tên zanîn û bi kar tên, hin jê li hin herêman bi kar tên. Heta hin biwêj ji aliyê gundekî tenê, yan çend gundan ve bi kar tên. Mînak: Ji Aqûb re gotin; tu ji kû ve têyî, got; ez ji Xeraqa têm; gotin; tuyê biçî kû; got; ezê biçim Xeraqa. (Xeraqa, li gundekî navê herêmeke pir piçûk e) Kesê ji tiştekî pir hes dike ev biwêj ji bo wî tê gotin. Ev biwêj li gundekî, pir pir li sê-çar gundan tê zanîn.

Sedema sereke ku gelek biwêj li hin herêman tenê tên zanîn û nabin malê civakê tevê, ew e ku zimanekî Kurdan yê fermî, nivîskî û navendî çênebûye. Sedema wê jî parçebûn û bindestiya Kurdistanê ye.

Bêguman; biwêjên di vê pirtûka di destê we de, mîna çend dilopên ji deryayê ne. Lewre ne derfet hene û ne temen têrê dike ku biwêjên kurdî tev werin berhevkirin. Çawa ku dest nade tev bên komkirin, ji ber ku nahatine nivîsîn, mixabin wisa bi hezaran hatine jibîrkirin jî.

Derbarê biwêjan de xaleke girîng ya din jî ev e: Di dîrokê de çawa ku heta roja îro bi pêşketina ziman re biwêj jî pêş ketine, ji îro bi şûn ve jî wê biwêj her tim xwe biafirînin. Ji ber ku ziman tiştekî zindî ye û her ku diçe xwe nû û dewlemend dike, biwêj jî her ku diçe xwe diafirînin û dewlemendtir dibin.

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1083 | 19-Tîrmeh- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# ŞOREŞA 19’Ê TÎRMEHÊ ŞOREŞA ŞEHÎDAN E

Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK’ê bi wesîleya salvegera Şoreşa Rojava daxuyanî da û got: Em şoreşa gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, gelê Kurdistanê, jinan, gelên Rojhilata Navîn û cîhanê pîroz dikin. Di şexsê şehîdên şoreşê de, em hemû şehîdên şoreşê û demokrasiyê bi rêzdarî û minetdariyeke mezin bi bîr tînin û soza ku me daye şehîdan, dubare dikin. R-3





## Şoreşa 19’ê Tîrmehê şoreşa jin û vejînê ye

R-2

## Şoreşa 19’ê Tîrmehê şoreşa rêxistinkirina civakê ye



Bi nêzîkbûna Şoreşa 19`ê Tîrmehê re, kar û xebatên TEV-DEM`ê û şêweyê sazbûyîna civakî li Rojava, bakur û rojhilatê Sûriyê têne meşandin. Girêdayî vê mijarê endamê Qordînasiyona TEV-DEM`ê Yûsiv Kûtê û Rêvebera Nivîsgeha Jinê ya Tevgera Civaka Demokratîk,Zeyneb Hesen dane zanîn ku kar û xebatên TEV-DEM`ê bûne bingha Şoreşa Rojava. **R-5**

## Bedran Çiya kurd: Şoerşa 19’ê Tîrmehê şoreşa heqîqetê ye




Hevserokê Desteya Karê Derve ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Bedran Çiya Kurd bi boneya salvegera 11’an a Şoreşa 19’ê Tîmehê di hevpeyvînekî bi rojnameya ronahî re got: Ku şoreşa civakî ya li Bakur û Rojhilatê Sûriyayê li ser bingeha şoreşeke rast û dirist hatiye afirandin û li sere vî esasî karîbû gavên mezin ber bi guhertina demokratîk û azadiya civakî de guhertin û veguhertinan pêkbîne.**R-4**

**Pêwîste Şoreşa Rojava bê parastin**
Zekî Bedran *R-5*

## Pêşketina Zimanê Dayikê Berhema Şoreşa 19’ê Tîrmehê Ye

Şoreşa 19’ê Tîrmehê vedenga gelê Kurd ji cîhanê re ragihand. Di hundir vê şoreşê de gavên pîroz hatin avêtin, yek ji wan jî pêşxistina zimanê dayikê ye. Hevserokê Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Semîre



Hej Elî da zanîn ku hebûna Zimanê Kurdî bi paradîgmeya Netewa Demokratîk xwe ji cîhanê re îsbat kir. **R-6**

## Şoreşa 19`ê Tîrmehê şoreşa sinc û çanda resen e

Şoreşa 19`ê Tîrmehê derfetekî mezin ji Çand û Hunera kurdan re da avakirin, ku hunera kurdan ya ber bi qirkirinê ve diçû, ji nû ve vejîn kir. Herwiha bi şoreşê re jinên bakur û rojhilatê Sûriyê, di aliyê çandî de jî pêngavên mezin avêtin û karîbûn bibin vedenga Şoreşa 19`ê Tîrmehê.
**R-7**

# Şoreşa 19’ê Tîrmehê şoreşa jin û vejînê ye

**Şoreşa Rojavayê Kurdistanê şoreşa vejîna jinê ye, jinên azadîxwaz di nava şoreşê de bi lêgerîna azadiyê xwe îsbat kirin, Li ser bingeha felsefeya Rêber Ocalan di serî de ji bo azadiya xwe û guhartina hişmendî têkoşîneke dîrokî dan meşandin.**

**Esma Mistefa/ Şehba**

Li ser esasê felsefeya Rêber Abdullah Ocalan, Şoreşa Rojavayê Kurdistanê bi bedelên gelek mezin hat destpêkirin. Şoreşa 19`ê Tîrmehê hêza xwe ji berxwedaniya 14`ê Tîrmehê ya ku mîrasê berxwedanî û têkoşîna doza azadiya gelê Kurd temsîl dike ye, li ser van nirxan şoreşa Rojava hat destpêkirin û bû şoreşa tavahî pêkhateyên ku di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de jiyan dikin.
Di nava têkoşîna 11 salan de jinên Kurd di nava şoreşê de şoreşa azadiya jinê dan destpêkirin, bi taybet li hember hişmendiya zilamparêz û desthilatdariya dewlet û civakê şerê îsbat kirina hebûn û nasnameya xwe dan meşandin. Li ser xeta doza azadiya jin bi bedelên giran jinên Bakur û Rojhilarê Sûriyê di milê civakî, dîplomasî, aborî, çandî û leşkerî xwe îsbat kirin. jinên Kurd bi fikirên netewa demokratîk û azadîxwaziya jin, ji bo jinên pêkhateyên ku di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de jiyan dikin xebetên gelek mezin dan meşandin û bi hev re gavên pîroz di dîrokê de dan avêtin.
Di şoreşa Rojavayê Kurdistanê de yekemîn hêza leşkerî ya jin hat avakirin. Hêza Parastina Jin YPJ ji bo tavahî jinên Kurd, Ereb, Ermen, Turkmen û suryan bû hêza yekemîn ya azadiyê û xwedîderketina jinê. bi baweriya xwe ya bi hêz û îradeya jinê re karî xwe li ser hemû astan xwe bi rêxistin bike û li hember terora DAÎŞ ê şer bike û bi bin bixîne. Ev bawerî û destkeftiyên bi dest xistine bû mîras ku di roja îro de berxwedaniya jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bibe mînaka jinên azad di cîhanê de.
Têkildarî pêşketina jin di qadên rêveberî û leşkerî de di şoreşa Rojavayê Kurdistanê de her wiha destkeftiyên ku bi xwe re dane avakirin Endamê Meclîsa zagonsaz li Şehbayê Fatmê Lektu û fermandarê Hêzên Parastina Jin YPJ Roksan… ji rojnameya me re axivîn.

**`Şoreşa Rojava şorerşa vejîna jinê ye`**

Fatmê di destpêka axaftina xwe de Şoreşa 19 ê Tîrmehê li tavahî gelên bakur û rojhilatê Sûriyê pîroz kir her wiha tavahî Şehîdê ku di oxira parastina axa welat de



Şehîd ketine bi bîr anîn. Fatmê bal kişand ser şoreşa Rojava şoreşa vejîna gelê Kurd e û wiha got: “Di sedsala 21`emîn de gavên mezin û yên pîroz ji bo gelê Kurd hatin avêtin di gîştî cîhanê de Kurdan bi felsefeya Rêber Abdullah Ocalan di serdema nûjen de careke din muhra xwe li dîrokê xist. Ev gav bi riya hilbijartina xeta sêyemîn di aloziya Sûriyê de hatin pêşxistin. Careke din gelê Kurd xwe bi hêza xwe û bi bedelên giran di şoreşê de xwe îsbat kir û bû mînaka şoreş û şoreşgerên cîhanê. Şoreşa



19 ê Tîrmehê ji bo tavahî gelên azadîxwaz û taybet gelê Kurd weke vejîneke nû bû ku bi hêviya ev şoreş bibe bingeha rizgarkirina tavahê axa Kurdistanê”.

**`Jin bi lêgerîna azadiyê derketin pêş`**

Fatmê da zanîn ku Şoreşa Rojava bersîva tavahî şoreşên ku di Sûriyê û di Rojhilata Navîn de pêkhatine da û wiha domand: “Tavahî şoreşên ku di Rojhilata Navîn de hatine destpêkirin ji wateya armancên xwe bi demê re hatin derketin û careke din bi destê hêzên hegemon hatin tepisandin û tu guhartin ji bo xizmeta gel nehatin avakirin. yek ji ne serketina van şoreşan ew jî tunebûna rol û hebûna jinê bûn, cihê ku jin lê neyê esasgirtin wê her wekî xwe bimîne û guhartinên cidî di civakê de wê neyên çêkirin. Ji lewra jî şoreşa Rojava li ser bingeha guhartina zihniyet û avakirina civakeke demokratîk hat destpêkirin lêgerîna jin ya ji bo azadiyê esas hat girtin û têkoşîneke berfireh hat kirin. Jin di biryargirtinê de weke hêzeke sereke hat esas girtin û di qadên civakê de jin bi îrade û hêza xwe ya ku bi sala hatibû tepisandin derket pêş”.

**`Di Sîstema Rêveberiya Xweser jin pêşeng e`**

Fatmê anî ziman ku jinan di Rojava de xwe di hemû aliyên jiyan û civakê de bi rêxistin kir û wiha domand: “Di hundir şoreşa Rojava de jinên Kurd bi hemû hêza xwe ketin nava tevgerê, di qadên perwerdeyê de cih girtin û ji bo xwe bûn hêz. Jinên Kurd di hemû herêman de sîstemên xwe yên rêveberiyê dan avakirin ji komîn, mala jin, kongireya Star û desteya jin de xwe bi rêxistin kir. Di sîstema rêveberiya Xweser de û li ser fikirên netewa demokratîk ya ku sîstema hevserokatiyê esas digire ji jêr heyanî jor jin ji %50 cihê xwe tê de girt. Hêjayî bîrxistinê ye ku yekemîn car e di cîhanê desteya jin tê avakirin, ev yek jî dengvedanek da çêkirin û jinan cihê xwe di asta herî jor de girtin. Her wiha di 2014 an de jin cihê xwe di nava PYD jî girt û di asta siyasî û dîplomasî de xebat da meşandin”.

**Avakirina rêxistinên xweser**

Fatma derbarê avabûna saziyên xweser wiha got: “Di nava civakê de rol û hebûna jinê di seranserî dîrokê de hatibû tunekirin. Bi avakirina şoreşa ku jin esas e li hember pirsgirêkên civakî û yên jin hewceye ku ewqas destgeh, sazî û kombûn werin avakirin. di civaka demokratîk de însanê demokratîk divê bê avakirin ji ber



viya jî ji bo guhartina hişmendiya civakê li ser jinê her wiha li hember pirsgirpêkan bibin cihê çareseriyê ev xebat hatin avakirin. di milê din de ji bo geşkirina aboriya jin û pêşxistina rola jinan bi hemû pêkhatieyên wa xebatên berfireh hatin destgirtin. Ji lewra jî e niha ni Bakur û Rojhilatê Sûriyê de ev rengê wekhevî û azadiyê dibînin. Helbet ev yek bi bedel û zehmetiyên mezin di seranserî 11 salan de hatin bidestxistin”.

**Şoreşa Rojava bi hêza jinên têkoşer hat geşkirin.**

Di heman çarçoveyê de Berdevka Yekîneyên Parastina Jin YPJ’ê Roksan Mihemed derbarê avakirina hêzên jin wiha got: “Li hember pergala ku hatiye avakirin û hilweşandina fikirên ku di kesayeta jinê de hatine mehkumkirin. Di nava şoreşa Rojavayê Kurdistanê de hewce bû ku jin di aliyê têkoşîna leşkerî de were avakirin. Yekemîn care jin di qada leşkerî de bi îrade, hêz û bi lêgerîna xwe ya ji bo azadiyê cihê xwe di nava xebatên leşkerî de diigire û gihîşt astên fermandariyê. Di dîroka 4’ê Nîsana 2013’an Yekîneyên Parastina Jin hat demezrandin, YPJ di van salên dirêj de xwe bi xwesrtiya xwe û bi baweriya xwe tavahî sînorên civakî yên kevneşop dan şikandin û bû hêzeke bingehîn di şoreşa 19 ê Tîrmehê û di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de”

**`YPJ bi hêz û îradeya xwe hat qebûlkirin`**

Roksan balkişand sere xebatên YPJ’ê yên girîng yên ku ji destpêk de hatine kirin û wiha got: “Di destpêka avakirina YPJ de gelek zehmetî hatin dîtin, civakê destpêkê ev yek qebûl nedikir. Ji ber bi hezar sala ye bi destê civakê rol û hêza jinê jê hatiye dizîn. Dema şoreş hatiye destpêkirin û ev yekîne hatkin avakirin bê guman di aliyê ev hêz bê qebûl kirin ji aliyê civakê de Zehmetî hatin jiyan kirin. YPJ tekoşîn û danasîna pêwîstbûna xwe parastinê da meşandin, her wiha li hember dijmin jin çawa dikare xwe biparêze û çiqas girînge ev yek ev zanebûn hatin pêşxistin. YPJ heyanî ku gihît vê astê kedeke mezin da da ku rastiya jina azad bide derxistin û civakê bi hebûn û hêza jinê bide bawer û qebûl kirin”.

**`YPJ dengvedana hêza jinê ye`**

Roksan diyar kir ku YPJ di têkoşîna xwe de şerê leşkerî û guhartina zihniyet da meşandin û wiha domand: “Di pêvajoya şoreşê û heyanê niha YPJ li hember zihniyetên ku hatine avakirin şerê guhartina zihniyet kir her wiha li hember dijmin şerê leşkerî da meşandin, di tavahî êrîşên ku di ser herêmê de hatine YPJ bi giranî tevlî wan pêngavan bû, di şengalê de YPJ bû xelasiya jinan û hêviya jiyaneke nû. Li hember terora DAÎŞ ê têkoşîna ku bi hêzên gîştî re hatiye raber kirin, dengvedana hêza jinê di cîhanê de da avakirin. YPJ ne tenê weke hêzeke leşkerî tê naskirin, YPJ di qadên siyasî, civakî û dîplomasî de xebatên mezin dide meşandin di encama têkoşîna bi salan YPJ derbasî qadên navnetewî bû û tavahî sînorên civakî derbaskirin”.

**`YPJ bi heqîqeta tekoşîna xwe derbasî navnetewî bû`**

Berpirsê Yekîneyên Parastina Jin Roksan Mihemed anî ziman ku YPJ bi hêza xwe derbasî qadên navnetewî bû û di cîhanê de xwe da îsbat kirin û wiha axaftina xwe bi dawî kir: “Hêza YPJ li ser hîmên azadiya jin û meşandina têkoşêneke rast li heber dijmin her wiha bi baweriya xwe bi hêz û vîna jina azad. Bi bedelên gelek giranbuha xwe ji cîhanê re îsbat kir ku tu kes nikare li pêşiya lêgerîna jina azad bibe bend. Tavahî pêkhateyên ku cihê xwe di nava YPJ de digirin bi îradeyeke pîroz ya azadiyê şer li hember dijmin didin meşandin. Her wiha destkeftiyên ku YPJ dane avakirin di herêmê de û derveyî herêmê tu kes nikare înkar bike. li ser van destkeftî û tekoşîna pîroz a ku daye meşandin YPJ derbasê astên navnetewî bû”.



# Şoreşa 19`ê Tîrmehê şoreşa sinc û çanda resen e

**Şoreşa 19`ê Tîrmehê derfetekî mezin ji Çand û Hunera kurdan re da avakirin, ku hunera kurdan ya ber bi qirkirinê ve diçû, ji nû ve vejîn kir. Herwiha bi şoreşê re jinên bakur û rojhilatê Sûriyê, di aliyê çandî de jî pêngavên mezin avêtin û karîbûn bibin vedenga Şoreşa 19`ê Tîrmehê.**

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Di şoreşên gelan de çand û huner qadeke girîng a têkoşînê ye, li Rojava jî tevgera çand û hunerê roleke mezin di şoreşê de lîst û bala hemû pêkhateyên civakê kişand. Çand û Huner bi pêşketina şoreşê re bi pêş ket ku rewşa gelên herêmê vedibêje, şoreşê rave dike, bûyerên wê belge dike, êşên wê tîne ziman û şehîdên wê bi bîr tîne. Her wiha roleke mezin di parastina coşa şoreşê de lîst. Wêneyek li ser têkoşîn û rizgariyê pêşkêş kir ku armanca herî bilind a ku şoreşa 19`ê Tîrmehê li ser bingeha wê dest pê kiriye.
Tevgera Çand û Hunera Demokratîk a Mezopotamya yê piştî şoreşa Rojava gavên girîng avêtin, bi armanca pêşxistina çand û hunerê, herwiha avakirina pirekê ku hunera kalsîk bi ya nûjen girê bide, gelek kar û xebat da meşandin.
Derbarê pêşketin, kar û xebat û rola çand û hunerê di Şoreşa 19’ê Tîrmehê de, endamê Rêveberiya Tevgera Çand û Hunerê a Mezopotamiyayê a bajarê Qamişlo Serhed Zana û Rêvebera Hîlala Zêrîn a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Fewaza Mihemed ji rojnameya me re axivîn.

**‘Xebatên Şoreşa Rojava di rûpelên dîrokê de hatine nivîsandin’**

Serhed Zana diyar kir ku şoreş bi xwe re zemîn û cih ava dike, welatekî azad be kar û xebatê çand û hunerê bêtir pêş dikeve û got: “Şoreşa 19`ê Tîrmehê derfeteke mezin ji kar û xebatê Çand û hunerê re da avakirin, şoreş bi xwe re zemîn û cih ava dik, welatekî azad be kar û xebatê çand û hunerê bêtir wê pêş bikeve. Herwiha Rojava jî niha dibe modêlek ji bo giştî kurdistanê û tevahî herêmê. Tevî êrîşên domdar yên ji aliyê dewleta tirk a dagirker ve ku li ser herêmê tên kirin, ku armanca van êrîşan qirkirna çanda kurdan û rakirina fikir û felsefeya Rêber Apo ya ku li cîhanê tevahî hatiye belavkirin, lê Tevgera Çand û Hunerê pêş ket û gelek kar û



**Serhed Zana**

xebatên girîn da meşandin. Rêber Apo ji hunermenda re dibêje; ew çavê herî mezin e ku beriya gelê xwe bi êşa welatê xwe dizane û bi riya hunerê derdixe. Xebatên Şoreşa 19`ê Tîrmerê di rûpelên dîrokê de hatine nivîsandin.”

**Avakirina projeya Netewa Demokratîk e**

Zana di dewamiya axaftina xwe de diyar kir ku di Şoreşa 19`ê Tîrmehê de, ji bo avakirina Netewa Demokratîke Tevgera Çand û Hunerê gelek xebat dan meşandin û wiha got: “Neteweyên Sûriyan, Asorî, Çerkezî û Ereb jî cihê xwe di nava tevgera Çand û hunerê de girtin. Tevgera Çand û Hunerê, Desteya Çandê û Hîlala Zêrîn di nav hevsengiyekê de, gelek xebatên girîng dan meşandin. Çanda ku ber bi qirkirinê ve diçû bi şoreşa 19`ê Tîrmehê re ji nû ve xwe ava kir. Hîn jî hunera şoreşê tam nehatiye avakirin, ji ber ku hunermend li gorî pêwistiyên civakê armancan ava dike, gava ku em hunermend pênase bikin pêşengê pêşenga ye, pêşengê şoreşgera ye, hunermend ne tenê di milê hunerî de dixebite, bi şoreşger û leşker re jî tekoşîn dike. Ji hunermend re heman demê dibêjin Hozan kesê ku xwe û civaka xwe nasdike di şexsê xwe de civakê dadihurîne û pêwîstî çi be li gor wan pêwistiyan jî hizira xwe pêk tîne.”

**‘Hunermend ava nebe huner jî ava nabe’**

Serhed Zana ragihand ku niha



**Fewza Mihemed**

ew hewl didin ku di pêşerojê de Akadimiyên hunerê vekin û wiha domand: “Di felsefeya hunerê de eger hunermend ava nebe huner jî ava nabe, ji bo wê pêwîste ku hunermend bên avakirin, ji bo vê yekê em hewl didin Akadimiyên çandî li tevahî bajaran vekin. Herwiha komên destpêkê yên kurdistanê ku di sala 83`an de mîna koma Botan û Agirî ku bi destê Rêbertî hatine avakirin, bone pêşeng ji çand û hunera tevahiya Kurdistanê. Ji despêka şoreşa 19`ê Tîrmehê û heta niha destkeftiyên mezin di warê hunerê de hatine bidestxistin, mîna Rêzefilmê Evîna kurd, Tava Sor, Fîlmê kobanê ku li kobanê hat kişandin, ev pir girîng bû û gelek kilîb, berhem, Fistîvlên û lîstokên hêja hatin çêkirin, ev hemû pêşketinên mezin ji hunera kurdî re ye. Bi 100`an Sitiran, Fîlim Belgefîlim, Şano, Fistîval, Wênesazî û hwd...hatin sazkirin. Vê yekê hişt ku hunermedên derveyî Rojava werin Rojava, ev jî hemû deskefteyên Şoreşê 19`ê Tîrmehê ne.”

**‘Huner ji bo civakê ye û civak jî wê hunerê dipijirîn e’**

Endamê Rêveberiya Tevgera Çanda û Hunerê a Demokratî a Mezopotamiya yê Serhed Zana axvitina xwe wiha qedand: “Hunerên ku beriya sedê salan hatibûn çêkirên pirek di navbera wê bi ya nûjen re çêbibû. Lê di vê Sedsalê de valahiyek di çanda me de hatibû çêkirin, ji bo vê yekê hêviyên me ewe ku em vê pira di navbera hunerê de bighînin hev. Rastiya ku civak jiyan dike huner derdixe holê. Şoreşê isbat kir ku huner ji bo civakê ye, civak jî wê hunerê dipijirîne.”
Rêvebera Hîlala Zêrîn a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Fewza Mihemed jî derbarê kar û xebatên Hîlala Zêrîn yê di şoreşa Rojava de û wiha got: “Bi Şoreşa 19`ê Tîrmehê re jinan di tevahiya qadên jiyanê de gavên mezin avêtin. Tevgera Hîlala Zêrîn a ku ji aliyê pêşengên jin ve kar û xebata wê tê meşandin, çand û hunera kurdan ji qirkirnê rizgar kirin. Bi kar û xebata xwe ya giranbuha xwe ji her milî ve isbat kirin û bi gelek berhemên xwe yên resen li ser civakê bandoreke mezin avakirin û bûne çavkaniya coş û kelecanê. Jinên kurd li hemberî tevahiya zehmetî û astengiyan li ber xwe didin û bûne pêşeng û pêkanîne û bûne pêşengê civakê û muhra xwe li dîrokê xistin.»

**‘ Jin li çanda xwe xwedî derdikeve û diparêze ’**

Fewza Mihemed berdewamî da axftina xwe û got:”Beriya şoreşa Rojava, jinên ku ji hêla malbat û hevjînê xwe ve rastî şidet dihatin û neheqî li ser wan dihate meşandin. Bi destpêka şoreşa 19’ê Tîrmehê ve û bi vekirina Navenda Çanda Hîlala Zêrîn perwerdeyên çandî ji temenê 6 salî heta dengbêjên bi temen mezin hatin destpêkirin û di vî warî de gelek pêşketin pêkhatin û encamên baş jî hatin girtin. Jin di nava komên govend, muzîk, şano, çîrok, helbest, wênexêzî, dengbêjî û nivîskariyê de cihê



xwe digre û roj bi roj di kar û xebata xwe de pêşdikeve. Herwiha di 19`ê Tîrmehê de jinên kurd ji hemû milî ve û bi taybet jî di warê pêşxistina çanda resen erkê xwe bi cih aniye. « sembol ji jinên cîhanê re.”

**‘ Jinan di 19`ê Tîrmehê de deskefteyên mezin pêk anîn’**

Fewza Mihemed di berdewamiya axaftina xwe de got:” Beriya şoreşa 19`ê Tîrmehê jiyana jinê ji aliyê malbat ê ve dihate qeyd û bend kirin. Ji ber sedema çanda civakê ya ku hişmendiya Bavik Salarî û çanda bav û kalan li ser jinê dihate meşandin, jin di rewşeke pir xirab de jiyan dikir. Jin di bin navê irf û adetên civakê bibû qurbana hişmendiya paşverû û mîna ku qedera jinê be ev yek li ser wê dihate ferzkirin. Li hemberî vê yekê jin bi tekoşîn û hewldanên xwe yên bê navber xwedî li dîrok û çanda resen derket û pêşxist. Jin bi hêz û vîna xwe ev kar û xebat pêşxist û ev yek jî mîna destkeftinên şoreşa 19`êTîtmehê mirov dikare bigre dest. Bi kar û xebatên ku jin dide meşandin û ji nûve avadike û diafirîne, dibe xwedî nasname û baweriya xwe bi xwe hîn xurtir dibe û baweriya civakê jî qezenc dike. Jinên çanda Hîlala Zêrîn ji 19`ê Tîrmehê û heta niha bi tekoşîn û hewldanên xwe destkefteyên mezin di hemû aliyên jiyanê de xwe digre û roj bi roj di kar û xebata xwe de pêşdikeve. Herwiha di 19`ê Tîrmehê de jinên kurd ji hemû milî ve û bi taybet jî di warê pêşxistina çanda resen erkê xwe bi cih aniye. «

**‘Jin pêşenga çand û jiyanê ye’**

Rêvebera Hîlala Zêrîn a Bakur û Rojhilatê Sûriy Fewza Mihemed axvtina xwe wiha bi dawî kir: Beriya 5000` sal hunermendên jin hebûn, lê di bin zagonên civakê de hatibûn bê bandor kirin û piştguh kirin. Lê jin bi tekoşîna xwe ku di 19`ê Tîrmehê de gavên mezin li ser erdê avêtin. Îro jî em encama van gavan dibînin ku jin di hemû qadan de cihê xwe digirn û xwedî û bi erkê xwe yê pêşengiyê radibin. Herwiha çanda jin a Hîlala Zêrîn bi tekoşîna xwe hêza jinê di riya çandê de derxist holê û tacîdar kir. Em bi navê hemû xebatkarên Hîlala Zêrîn Şoreşa 19`ê Tîrmehê li tevahî jinên cîhanê bi taybet jî, li Rêber Apo pîroz dikin û hêviya me ji hemû jinên cîhanê ew e, ku em li çanda xwe xwedî derkevin û biparêzin.”

# Pêşketina Zimanê Dayikê Berhema Şoreşa 19'ê Tîrmehê Ye

Şoreşa 19 ê Tîrmehê vedenga gelê Kurd ji cîhanê re ragihand. Di hundir vê şoreşê de gavên pîroz hatin avêtin, yek ji wan jî pêşxistina zimanê dayîkê ye. Hevserokê Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Semîre Hej Elî da zanîn ku hebûna Zimanê Kurdî bi paradîgmeya Netewa Demokratîk xwe ji cîhanê re îsbat kir.

**Zana Roj/ Şehba**

Bi şoreşa 19 ê Tîrmeha sala 2012 an de, gelê Kurd şoreşa vejînê ya doza azadiya gelê Kurd destpêkir. Bi hilbijartina xeta sêyemîn di kirîza Sûriyê de hêza şervanên azadiyê û gelê azadîxwaz û bi bedelên pir giran gavên pir giring hatin avêtin. Gelê Kurd bi hêz û baweriya xwe ya azadiyê, gelek destkeftiyên dîrokî bi dest xistin. Ev destkeftî roj bi roj mezintir dibin û gelê Kurd muhra xwe li dîrokê dixe. Yek ji destkeftiyên herî bi nirx yên ku rengê şoreşa Rojavayê Kurdistanê guhartiye, ew jî avakirina sîstema xwendinê û pêşxistina zimanê dayîkê ye. Zimanê Kurdî ji gavên sereke yên ku hatine avêtin bû û yekemîn dibistana Kurdî li Rojavayê Kurdistanê li bajarê Efrînê li gundê (Duraqliya) yê girêdayî navçeya Şera di 6 Koçêra 2011'an de hat vekirin.

Di destpêka şoreşê de saziya ziman weke Saziya Zimanê Kurdî (SZK) dihat pênasekirin, fêrkirina zimanê dayîkê û rêzimana Kurdî bi awayê astan dihat dayîn û li ser 3 astan rêzimanê Kurdî dihat xwendin. Ev yek ji bo xwendekaran dibû bingeha naskirin û fêrbûna rêziman. Di demeke kin de Zimanê Kurdî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê weke minhac di tavahî dibistanan de hate xwendin. Sîstema xwendinê li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê hate rêxistinkirin. Ji dibidtanan ber bi vekirina peymangeh û zanîngehan, gavên mezin hatin avêtin.



Derbarê pêşketina perwerde û zimanê dayîkê di Şoreşa Rojavayê Kurdistanê de hevseroka Desteyas Perwerdê û Fêrkirinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Semîra Hej Elî ji rojnameya me re axivî.

**`Bi lêgerîna azadiyê Şoreşa Rojava bi ser ket`**

Semîre da xuyakirin ku Şoreşa 19'ê Tîrmehê bû çirûska vejîna zimanê



**Semîre Hej Elî**

Kurdî li Rojavayê Kurdistanê û wiha got: "Gelê Kurd di çar aliyê Kurdistanê di nava qirkirineke zayendî û çandî re dihat derbas kirin û ev yek jî tê berdewamkirin. Ji bo tunekirina Kurdan polîtîkeyên cur be cur yên asîmîlekirinê didin meşandin. Rêjîma Bass ku li Sûriyê desthilatdar bû, ji van polîtîkeyan ne qut bû, çanda resen ya gelan dihate tunekirin bi taybet ji bo gelê Kurd bi hemû awayî ji nasnameya wan dihatin durxistin bi riya dibistan û erkên leşkerî her wiha di nava saziyên dewletê de kesayeta Kurd ji hebûna wî ya netewî dihate qut kirin. di aliyê ziman de yek car hatibû qedexekirin di dibistana de bi zimanê Kurdî axaftin ev ne mumkîn bû û yê ku ev zagon derbas dikir rûxmî ku zarok e dihatin ceza kirin. ji ber wiya jî şoreşa Rojavayê Kurdistanê weke çirûska azadiyê ji bo tavahî gelên Kurd hat pênasekirin û bi ser ket".

**`Zimanê Kurdî bi kedeke pîroz gihişt vê astê`**

Semîre destnîşan kir ku bingeha destkeftiyên ku niha hatine avakirin Saziya Zimanê Kurdî ye û wiha domand: "Civaka ku bi sala ne di bin siya dagirkerî û pişaftinê de jiyan dikir û rojane rastî tunekirinê dihat. Bi rastî ev şoreş bi gîştî ji bo hebûna gelekî hat pênasekirin. Xeyalên ku d mejiyê gelê kurd de bû, ji nû ve hatin vejînkirin.Bi taybet ji bo girîngiya ziman di civakê de xebatên cidî hatin destpêkirin. Saziya zimanê Kurdî ji sala 2011'an heyanê 2018'an rola perwerdekirina civakê bi riya vekirina sîstema astên Kurdî, amedekirina mamosteyan û sîstema xwendinê avakirin dilîst. Di vê çarçovê de bi girîngî kar û xebatekî berfireh weke bingeh hat amedekirin û di sala 1019'an de minhaja bi Kurdî fermî di dibistanan de hat xwendin. Her wiha têgeh û pirtûk hatin çêkirin û wergerandin di heman demê de ferhengên Kurdiya resen hatin amedekirin û lêkolînên rêzimanî hatin kirin. bi gîştî bi kedeke



pîroz zimanê dayîkê di şoreşê de hat pêşxistin û gihîşt roja me ya îro, her wiha li kêlek saziya zimanê Kurdî saziya zimanê Suryanî jî hat avakirin û bi wê wesîleyê pêkhateya Suryan zimanê suryanî pêşxistin."

**`Peymangehên amedekirina mamosteyan hatin pêşxistin`**

Semîre diyar kir ku ji bo amedekirina mamosteyan xebatên perwerdekirinê hatin pêşxistin û wiha got: "Ji bo pêşxistina mamosteyan di aliyê xwendinê de xebatên taybet hatin pêşxistin, li ser esasê firkrên netewa demokratîk peymangehên zimanê Kurdî yên xurtkirina asta mamosteyan di seranserî Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatin vekirin. Li ser minhaja Rêveberiya Xweser mamoste hatin amedekirin. Her wiha ji bo pêkhateya Suryan jî ev peymangehên biranşan hatin vekirin. Armanc ew e ku asta xwendekar di aliyê zanistî û wêjeyî bi zimanê dayîkê were pêşxistin".

**Znîngehên ku hatine vekirin di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de**

Semîra girêdayî zanîngehên ku di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de hatine vekirin wiha anî ziman: "Di destpêka şoreşa Rojavayê Kurdistanê de weke ku tê zanîn yekemên zanêngeh girêdayî sîsteram Rêveberiya Xweser û li ser esasê peredîgmaya netewa demokratîk li Herêma Efrînê hat vekirin di 2015 an de . Di zanîngeha Efrînê de 6 fakolteyên zanistî û wêjeyî hebûn û fakulteyên heyî ev bûn (Bijîşkî, aborî, Ragihandin, ziman û wêjeya Kurdî, Mîkatronîîk û çandinî). Her wiha di bajarê Efrînê de 2 peymangehên bi navê Ş. Viyan Amara hatin vekirin. Lê belê bi dagirkirina Efrînê 2018 an de, gel bi dare zorê derbasî herêma Şehbayê bû, di bin şert û mercên gelek zehmet de careke din sîstema xwendinê hat avakirin û peymangeha Ş. Viyan Amara careke din hat vekirin. Her wiha xwendekarên ku refa 12 diqedînin derbasî zanînegeha Rojava û ya Kobanê li gorî xwesteka wan ya xwendinê dibin."

Duyemîn zanîngeh piştî zanêngeha Efrînê hat vekirin zanîngeha Rojava bû ku di sala 2016'an li Bajarê Qamişlo hat vekirin. Her wiha şaxên zanêngehê li Hesekê û Rimêlanê hatin avakirin. zanîngeha Rojava de 10 fakulteye û 3 peymangehên wêjeyî û zanistî hene, û ji destpêka demezrandina zanîngehê de 5 dewreyên derçûnê hatine derketin û hejmara xwendekarên ku hatine derketin 700 xwedekar bûn.

Li bajarê Kobanê piştî rizgarkirina Kobanê ji terora DAÎŞ ê. Di dîroka 10 ê Çileya 2017 an de hat vekirin. Di zanîngeha Kobanê de 3 Fakulte û 7 peymangehên wêjeyî û zanistî hene. Hêjayî gotinê ye ku heyanî niha 2 dewreyên derçûnê hayine derketin.

Girêdayî zanîngehên ku di herêmên Rêveberiya Xweser de hatine vekirin zanîngeha El Şerq e, di sala 2021 an de zanîngeha El Şerq ku piraniya wê bi zimanê Erebî tê xwendin li bajarê Reqayê hat vekirin. Zanîngela El Şerq ji 4 fakulte û 3 peymangehên wêjeyî û zanistî pêk tê. Zanîngeha El Şerq bû 2 sal hatiye demazrandin her wiha wê îsal yekemîn dewreya peymangehan wê derbiçin.

**`Aramanca Şoreşê avakirina sîstema xwendinê ya ku xwe disipêre demokrasiyê`**

Semîre diyar kir ku di seranserî salên şoreşê de gelek destkeftiyên mezin di aliyê sîstema xwendin û pêşxistina ziman de bi bedelên giran hatin bidestxistin û wiha domand: "Şoreşa Rojavayê Kurdistanê bi bedelên gelek giranbuha gihîşt vê astê, li hember tavahî cîhanê di hemû aliyên civakî, siyasî, dîplomasî, çandî û leşkerî xwe da îsbat kirin. Bi taybet di aliyê pêşxistina zimanê dayîkê û avakirina sîstema xwendinê ku xwe disipêre demokrasî û wekheviyê gelek gavên mezin hatin avêtin ku îro mafê tavahê pêkhateyên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi hemû aliyên xwe tê parastin û bi ziman û çanda xwe jiyan dikin. Pêkhatieya Ereb di dibistan û zanîngehên Rêveberiya Xweser de bi zimanê Erebî yê dayîkê xwendina xwe dikin. Yek ji destkeftiyên herî girîng ev e ji bo armancên vê şoreşê werin bi cih kirin. Di heman demê de avakirina minhajekî derveyî sîstemên gilobal yên kapîtalîst avakirin gelek zehmet bû lê bi kedeke mezin hat avakirin û niha ji dibistanan heyanî zanîngehan şêwazê nirxandinê esas tê girtin."

**`Ji berhemên 19 ê Tîrmehê xwendina Mastir bi zimanê dayîkê hat vekirin`**

Hevserokê Desteya Perwerde û Fêrkirinê Semîre Hej Elî destnîşan kir ku bi zimanê dayîkê xwendina Mastir hat vekirin û wiha got: "Bi hêviyên gelek mezin ev şoreş hat mezin kirin û gihîşt serfiraziyê. Bi gavên biçûk hat destpêkirin û niha jî zimanê Kurdî derbasî zanîngehên cîhanê dibe. Di encama kedeke mezin de di van salên dawiyê de xwendekarên Bakur û Rojhilatê Sûriyê yên ku zanîngeh qedandin derbasî asta Mastir bi zimanê Kurdî bûn. Fakulteyên ku Mastir dixwînin ev in (Wêje û zimanê Kurdî, Perwerde nasî, zanistên civakî û dîrok). Niha di sala xwe ya duyemîn de berdewam dikin. Ev yek ji serkeftinên herî mezinin ku di sedsala 21 emîn de pisporên zimanê Kurdî werin amedekirin û bigihêjin asta Mastir".



# KCK'ê: Şoreşa Rojava mîrateya hevpar a gelên Kurdistan û Rojhilata Navîn e

Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê bi wesîleya salvegera Şoreşa Rojava daxuyanî da û bal kişand ser Peymana Lozanê. KCK'ê got: "Divê hemû hêzên welatparêz li dora Şoreşa Rojava, yekîtiya neteweyî pêk bînin."

**Navenda nûçeyan**

"Di 19'ê Tîrmeha 2012'an de li Rojava pêngaveke dîrokî hat avêtin û Şoreşa Rojava ku yek ji pêşketinên herî girîng a dîrokê ye, pêk hat. 11 sal li ser vê geşedana dîrokî derbas bûn. 11 sal in Şoreşa Rojava êrîşkariya qirker, mêtinger, paşverû û faşîst têk dibe; hîna jî hêviya jiyana wekhevî, azad û demokratîk a gelê Kurdistanê û gelên Sûriye, Rojhilata Navîn û cîhanê ye. Em Şoreşa Rojava pîroz dikin ku 11 sal li dijî her cûre êrîşkariyan li ber xwe dide û wan êrîşan pûç dike. Em vê geşedana dîrokî silav dikin. Em vê şoreşa mezin li gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, gelê Kurdistanê, jinan, gelên Rojhilata Navîn û cîhanê pîroz dikin. Di şexsê şehîdên vê şoreşa mezin de, em hemû şehîdên şoreşê û demokrasiyê bi rêzdarî û minetdariyeke mezin bi bîr tînin û soza ku me daye şehîdan, dubare dikin. Şoreşa Rojava mîrateya hevpar a gelên Kurdistanê û Rojhilata Navîn, jinan, gelên cîhanê yên bindest û her kesê ku têkoşîna wekhevî, azadî û demokrasiyê dide ye. Parçeyekî têkoşîna wekhevî, azadî û demokrasiyê ye û pêngaveke mezin e ku li ser vî bingehî hatiye avêtin.

Şoreşa Rojava di encama têkoşîna azadiyê ya gelê Kurd de pêk hatiye. Ev şoreş destpêkê bi saya xebat û keda Rêber Apo ya bi dehan salan, pêk hatiye. Rêber Apo bi xebatên xwe bingehê fikrî û rêxistinî ya vê şoreşê avêtiye. Şoreşa Rojava li ser bingehê fikir, paradîgma û xebatên Rêber Apo pêş ketiye. Em Şoreşa Rojava li Rêber Apo pîroz dikin û spasiya wî dikin ku geşedaneke wisa dîrokî pêk aniye.

Şoreşa Rojava; xwe dispêre



berhamiyên têkoşîna wekhevî, azadî, edalet û demokrasiyê ya dîroka mirovahiyê û ders ji şoreşên beriya xwe derxistiye û wisa pêk hatiye. Rêber Apo, pêşketina dîrokî ya mirovahiyê ji nû ve dest girt û ferqa di navbera sîstema dewletê ya mêtinger û sîstema civakî ya li ser esasê jiyana wekhevî, azadî û demokratîk daniye holê. Rêber Apo paradîgmayek nû danî holê ku şoreş li ser bingehê azadiyê pêş bikevin. Şoreşên berê ji ber ku serî li rêbazên amûrên sîstema dewletparêz didan, negihiştin encamên ku dixwestin û ji aliyê sîstema dewletparêz ve hatin daqurtin. Rêber Apo têgihiştina sosyalîzmê ya ji dervey dewletê, li ser bingehê fikrî û rêxistinê pêş xist. Tişta ku Şoreşa Rojava cuda kir, têgihiştina sosyalîzmê ye ku Rêber Apo ew têgihiştin ji dervey dewletê pêş xist. Şoreşa Rojava li ser esasê vê têgihiştinê pêş ketiye û gelek gavên girîng hatin avêtin. Ev yek ji aliyê têkoşîna wekhevî, azadî û demokrasiyê ve pêşketinek gelek girîng e.

Şoreşa Rojava bi nêzîkatiyek pir bi heq, weke şoreşa jinê tê dîtin û tê anîna ziman. Yek ji taybetmendiyên herî girîng a Şoreşa Rojava ew e ku xwe dispêre têgihiştina azadîxwaziya jinê. Ev yek taybetmendiya bingehîn e ku Şoreşa Rojava ji şoreşên din cuda dike. Ev di heman demê de tê wateya hêzeke gelekî mezin. Ji ber ku endama bingehîn a jiyana civakî, jin e. Di vî warî de dema Şoreşa Rojava tê gotin, rastiya bingehîn a were fêmkirin ew e ku li dijî zihniyeta mêrserwer e û xwe dispêre azadiya jinê. Ji xwe rolê diyarker a jinê û pêşengiya jinê di avabûna Şoreşa Rojava de heye. Ji ber vê taybetmendiya xwe Şoreşa Rojava bala jinên Rojhilata Navîn û jinên hemû cîhanê û hemû kesên di lêgerîna azadiyê de dikêşe. Şoreşa Rojava weke hêviyê tê dîtin.



Gelê Rojava û hêzên şoreşger çeteyên faşîst ên paşverû yên DAIŞ'ê têk birin û hemû cîhan ji xeteriyeke mezin rizgar kirin. Bêguman li dijî faşîzma DAIŞ'ê bi berdêla zêdeyî yanzdeh hezar şehîdan şer kir û ev şer bi ser ket. Lê her çiqas ev rastî ji aliyê her kesî ve tê zanîn jî dewlet bi awayekî adil tevnagerin. Berovajî vê, li hemberî êrîşên dagirkeriyê yên desthilatdariya faşîst a AKP-MHP'ê ku çeteyên DAÎŞ'ê xwedî dike, di serî de li dijî Rojava û gelan komkujî û qirkirinan pêk tîne, ti helwest nayê girtin û ev êrîşkarî tê erêkirin û destekkirin. Di civîna NATO'yê ya li Lîvanyayê de lihevkirin û biryarên ku li dijî Kurdan û Rojava hatin girtin, ev polîtîkayên dewletan ên berjewendîperest û durû bi awayekî zelal derxist holê. Ev biryar û lihevkirin tê wateya xizmetkirina polîtîkayên li ser qirkirina Kurdan û şirîkê qirkirina Kurdane.

Nêzîkatiya bi vî rengî ya li hemberî gelê Kurd û Rojava teqez nayê qebûlkirin. Şoreşa Rojava mirovahî li hemberî DAIŞ'ê parast û di vê dozê de bi hezaran şehîd dan. Divê dev ji vê helwesta li hemberî gelê Kurd û Rojava bê berdan, piştgirî neyê dayîna dewleta Tirk û desthilatdariya AKP-MHP'ê. Dewleta Tirk û desthilatdariya AKP-MHP'ê ku dewletê bi rê ve dibe; Zihniyeteke wê ya dijberiya Kurdan heye û hemû têkiliyên xwe bi hestên dijberiya Kurdan ava dike. Lê belê ji ber ku dewleta Tirk bi vî rengî nêzîk dibe, nabe ti hêz û sazî wisa nêz bibe û têkiliyên xwe yên bi Tirkiyeyê re li ser dijminatiya Kurdan ava bike.

Planên dewleta Tirk û faşîzma AKP-MHP'ê ya ji bo Şoreşa Rojava û sîstema demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tê zanîn. Li dijî vê êrîş, dagirkerî û êrîşên qirkirinê, divê di serî de gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi hêzên şoreşger re li ber xwe bidin û van êrîşan bişkînin. Ji bo vê jî divê hemû lêhûrbûna xwe bide berxwedanê, amadekariyên şer ên berfireh bike û xwe bigihîne asteke ku her cure êrîşan bişkîne. Divê gelê Kurdistanê yê welatparêz li her derê bi gelê Rojava re di nava piştevanî û têkoşîneke aktîf de bin. Divê ciwan, jin, gel, hemû beşên şoreşger, sosyalîst, pêşverû û dostên li çar aliyên cîhanê bi Rojava re di nava piştevaniyê de bin, li dijî têkiliyên ku dewlet bi desthilatdariya AKP-MHP'ê re li dijî gelê Kurd û Rojava ketine nav liv û tevgerê berteknîşan bidin û bikin ku dewlet paşde gav bavêjin. Ger bi vî rengî berxwedan û têkoşîneke topyekûn pêş bikeve, êrîşên li dijî Rojava dikarin vala bên derxistin û xeterî jî ji holê bê rakirin. Em bang li her kesî dikin ku li ser vê bingehê xwedî li erk û berpirsyariyên xwe yên dîrokî derkevin û di salvegera 11'emîn a şoreşê de em hemû kesên ku dilê wan bi Şoreşa Rojava re lêdide û bi taybet Rojava û hemû gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê silav dikin û bejna xwe li ber wan ditewînin."

# Şoreşa 19'ê Tîrmehê şoreşa ji nû ve avakirinê ye

**Meclîsa Kongra Star bi daxuyaniyek nivîskî salvegera 19'ê Tirmehê pîroz kir û bang li jinan kir ku her jinek ku dilê wê ji bo azadiyê lêdide dakeve qadan û destkeftiyên şoreşê misoger bikin.**

Meclîsa Kongra Star bi daxuyaniyek nivîskî salvegera 11'emîn a Şoreşa Rojavayê Kurdistanê pîroz kir.

Daxuyaniya ku hate dayîn wiha ye: "Em bi rihê şehîdîn şoreşê, Avşîn, Arîn, Barîn, Zehra, Jiyan Tolhildan,Yusra, Rîhan û bi sedan şehîdên ku nikarin navên wan li vir deynin, li Rêber Apo, şehîdan, gelê me yê welatparêz, berxwedanvanên zîndanan, gerîlayên serê çiyê, gelên demokrat, azadîxwaz pîroz dikin û bejna xwe li hemberî şehîdên şoreşê ditewînin û heta dawiyê em ê li mîrasê wan xwedîderkevin û di rêya wan de bimeşin.

**'Şoreşa jin, jiyan û hebûnê bû'**

Şoreşa 19'ê Tîrmehê şoreşa demokrasî, azadî û wekheviyê ye, şoreşa ji nû ve avakirinê ye. Şoreşa jin, jiyan û hebûnê ye. Şoreşa Rojava, Şoreşa azadkirina jiyanê a demokrasî û adaletê ye. Bi şoreşa 19'ê Tîrmehê ve di pêşengtiya jin de ji nû ve jiyan hat afirandin. Bi şoreşa 19'ê Tîrmehê re gelek ji nû ve avabû, şoreşa 19'ê Tîrmehê şerê azadî, wekhevî û hebûnê bû. Bi şoreşa 19'ê Tîrmehê re rihê 14'ê Tîrmehê ji nû ve zindîbû û xwedî li mîrasê berxwedana wan derketin bû. Nûjenkirina rihê Kemal û Xeyriyan bû. Şoreşa 19'ê Tîrmehê darbeyekî mezin a li dijî hişmendiya zilamê desthilatdar ê 5 hezar salan bû. Di pêşengtiya jinan de, rêxistinekî Terorîst a wekî DAIŞ'ê ya hov ku çi artêşan xwe li bernedigirt, hat şikandin û tovê jiyanekî nû hate avêtin.

**'Pêta agirê şoreşa Rojava, di sala 2012'an de li Kobanê hat pêxistin'**

Bihara Ereban a li Tunusê destpêkirî, piştî desthilatdariya Misir û Lîbyayê hilweşand, derbasî Sûriyê bû. Xwepêşandanên sîvîl ên Adara 2011'an de li Sûriyeyê hatîn li darxistin, her çendî Kurd destpêkê nebibin alî jî lê piştî wê ji ber nêzikatiyên rejîmê yên îsrara di înkar û îmhayê de û nêzikatiyên mixalefeta Sunî ya yekalî û li gorî xwe, hişt ku Kurd xeta sêyem a di pêşengtiya fikir û ramanê Rêper Apo de pêşketî hilbijêrin. PYD'ê bi awayekî çalak nûnertiya xeta sêyem kir. Kurdên ku ji aliyê rejîmê ve bênasname hatîn hiştin, bi awayekî bê sedem di zîndanan de dirizandin, nebûn parçeyekî mixalefeta Sûriyeyê a ku dewleta Tirk ji wan re pêşengtî dikir û di pêşengtiya jinê de, dest biavakirina şoreşê kirin.

**'Agirê şoreşê yê destpêkê di pêşengtiya jin de pêket'**

Kurdên Rojava piştî Adara 2012'an bi awayekî vekirî politikaya xeta sêyem parastin. Ji milekê ve her ku diçû li kolanan xwepêşandanên li dijî rejîmê pêşdiketin, ji milekê ve Kurdan jî hêdî hêdî binezasiya Rêveberiya Xweser avêt in. Destpêkê gelê Kobanê yê ji aliyê dewletê ve hatîn bênasnamekirin, axên dewletê ji wan standî desteserkirin. Gelê heremê meclisên gel avakirin û bi vê rêbazî tovê rêveberiya gel reşandin. Di milê tenduristî, perwerde, xizmeta şaredariyan û ewlehiya gel de gelek gavên giring û bikok avêtin. Agirê li Kobanê hatî pêxistin, li Dêrik, Efrîn û Qamişlo hat gurkirin. Kurdan hem xwe birêvedibir, hem jî ewlehiya herema xwe digirtin. Di vê çarçoveyê de em dikarin bibêjin ku Şoreşa Rojava ji bo cîhanê bû ronahiya azadiyê û hêvî da gelên bindest. Bû neynika îradeya jina azad, da nîşandan ku , jin û gel ne bê alternatîfin, di vê çarçoveyê de jinê jî di her aliyê jiyanê de xwe rêxistin kir û pêşengtî kir.

'Destkeftiyên şoreşê misoger bikin'

Em hatine wê astê ku êdî destkeftiyên şoreşê bi hişmendiya jina azad û li gorî xeta şehîdan bi awayekî rast biparêzin û destkeftiyên xwe mezin bikin. Cardin li gorî felsefeya şerê gelê şoreşgerî em ê wekî Kongra Star, her kolan, tax û bajarên xwe biparêzin. Naveroka karê xwe hîn pirtir tijî û xurt bikin û di xeta sêyem a di pêşengtiya Rêber Apo de pêşketî de îsrar bikin, Heta ku em tecrîta li ser Rêber Apo bişkînin û azadiya wî ya fîzîkî misoger bikin. Bangawazî dikin ku her jinekî ku dilê wê ji bo azadiyê lê dide dakeve qadan û destkeftiyên şoreşê misoger bike.

# Bedran Çiya kurd: Şoreşa 19'ê Tîrmehê şoreşa heqîqetê ye

Hevserokê Desteya Karê Derve ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Bedran Çiya Kurd bi boneya salvegera 11'an a Şoreşa 19'ê Tîmehê di hevpeyvînekî bi rojnameya ronahî re got: Ku şoreşa civakî ya li Bakur û Rojhilatê Sûriyayê li ser bingeha şoreşeke rast û dirist hatiye afirandin û li sere vî esasî karîbû gavên mezin ber bi guhertina demokratîk û azadiya civakî de guhertin û veguhertinan pêk bîne.

**Dilyar Cizîrî**

Çiya Kurd bal kişand ser dijerbî û êrişên li dijî sîstema civakî ya gelê herêmê û destnîşan kir ku gelê herêmê ku di hemû qadan de gavên mezin avêtine, wê bi hevgirtin û rêxistinbûyîna xwe karibin hemû planên li dijî herêmê têne rêzkirin vala derbixin.

Hevpeyvîn wiha ye:

1-Em pêşwaziya Salvegera 11`an a Şoreşa 19`ê Tîrmehê dikin, piştî 11 salan mirov dikare bêje ku gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê çiqas encamên hêvî dikir bi dest xistine?

Şoreşa 19'ê Tîrmehê li Sûriyê û tevahî herêmê guhertinên bingehîn ên nû û piratîkî di aliyên siyasî, leşkerî, çandî û civakî de ava kiriye. 19'ê Tîrmehê li ser bingehên şoreşeke rast û dirust hatiye afirandin. Di encamê de nêrîn û rêgezên kilasîkî di aliyê rêveberiyê de şikandin û rêgezên birêkûpêk ên rêveberiya civaka xwe bi xwe saz kiriye.

Tevî hemû hewldanên hilweşandina bingehên şoreşê, êrişên tunekirinê û dagirkirinên pêk hatin nîşaneya herî ber bi çav a van rastiyan bû, şoreşa 19'ê Tîrmehê hîn bi hemû hêza xwe dewam dike. Mayîn û berdewama şoreşê ya bi hêz nîşan dide çawa dikare hemû pêdiviyên civaka me û ya tevahî Sûriyayê pêşwazî bike. Hîn jî ev şoreş nûnertiya hêvî û daxwazên rast ên pêkanîna çareseriya demokratîk li Sûriyayê dike. Çi dibe bile bibe gelê me wê hevgirtin û xwedîderketina li hev bidomîne û wê ber bi pêşketinên giring ve biçe. Şoreşa 19'ê Tîrmehê deriyê rast ê çareseriya demokratîk a li Sûriyê ye û di heman demê de zemîna avakirina îradeya gelan e.

2-Dijmin rê û rêbazên cûda û bi hêzeke mezin li dijî herêmê didin meşandin, li gorî we xeteriyên li ser destkeftiyên şoreşê çi ne?

Bê guman hewldanê tesfiyekirinê bê navber berdewam dikin, hîn jî armanca wan ew e çawa şoreşa gelê me û ezmûna wê ya demokrasiya rast di herêmê de tune bikin. Ji destpêkê ve zehmetî û astengiyên li pêşiya şoreşê gelek in û hîn jî didomin. Tevî wê jî şoreş berû qonaxên giring ve xwe pêş xist. Di heman demê de nirx û destekftiyên heyî li beranberî gef û zehmetiyên mezin ku ji her çar aliyan ve dihatin, hatin parastin. Hêz û sîstemên dijber her dem guman dikirin, dê ev şoreş nikaribe dewam bike û destkeftiyên xwe biparêze. Wan wiha texmîn dike, wê tenê çend mehan ber xwe bide û wê paşê têk biçe. Hîn jî bi hemû hêza xwe armanc dikin, îradeya gelê me ya ji bo azadiya demokratîk têk bibin.



Niha jî bi hemû hêza xwe dixebitin ji bo hevgirtina civakî û yakîtiya di herêmê de saz bûye, asteng bikin. Dijmin bi hemû hêza xwe hewl dide projeya Netewa Demokratîk asteng bike. Xeteriyên rast hene û pêwîste em li hember wan derkevin. Rêgeza berxwedanê jî mayîna bi berdewam û parastian destkeftiyên gelê me û civaka me ye. Di heman demê de avakirina îradeya azad e.

3-Di serî de dewleta Tirk û hikûmeta Şamê gelek dixwazin sîstema rêveberiya herêmê ya heyî hilweşînin, di nêrîna we de gelê Şoreşa 19`ê Tîrmehê bi encam kir wê çawa karibe destkeftiyên xwe biparêze?

Min di bersiva pirsên din de jî bal kişand ser van xalan, hêz di pêşxistina şêwazên rawestandina hewldanên astengiyên pêşxistina îradeya civakê diyar dibe. Di pêşxistina hewldana rawestandina binpêkirina nirxên şoreşa demokratîk kom dibin. Di heman demê de di xebatên berdewam ên rawestandina pêşketina terorê û hêza tekoşîna li dijî wê nîşan dibe. Li aliyê din jî di yekîtiya pêkhateyan bi hemû reng û cûreyên xwe ve. Her dem armanca dijberan astengkirin û belavkirina yekîtiya gelê me û pirojeya netewa demokratîk e. Tekane pirojeya nûnera bingehîn a serxistina şoerşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê, şoreşa 19'ê Tîrmehê ye.

Ji lewma tê xwestin bi şêwazyekî mezin hemû hêz di xizmeta civakî, siyasî û parastinê de be. Di heman demê de di sîstema rêxistinkirina civaka azad a rêxistinkirî de be, bingeha wê jî rêgezên Şerê Gel ê Şoreşger e.

4- Bi pêşengtiya gelê kurd şêniyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi hemû pêkhateyên xwe ve xeta sêyemîn esas girt û gavên mezin bi dest xistin, ev xet ji bo çareseriya aloziya tevahî Sûriyê çiqas giringe?

Di nava şerê li ser desthildariyê xeta sêyemîn isbat kir ku dikare nûnertiya hemû pêwistiyên netewî yên gelê Sûriyayê bike. Mixbatin hemû projeyên li ser Sûriyê û planên hatin kirin ber bi xetimîn û neçareseriyê ve çûn. Hemû veghezîn parastina xetên siyasî û ketin berjewendiya pirojeyên kesê ji derveyî Sûriyayê. Ji ber wê jî aloziyên heyî kûrtir kir û girêka pirsgirêka Sûriyê asê kir. Di rewşeke wiha de xeta me (xeta sêyemîn) hîn jî nûnertiya hêviyên rast ên gelê Sûriyê bi hemû beşê wê ve dike.

Ji ber wê û di demekê de ji ber



destwerdanên derve di aloziya Sûriyê de guhertinên mezin di aliyê meydanî û siyasî de çêbûne, bi taybet ji ber dûrketina hêza bi navê opozisyona Sûriyê li xwe dike ji berjewendiyên gelê Sûriyayê. Herweha em ji bo çareseriya niştîmanî ya alzoiya Sûriyê hîn jî bi rêgezên xwe yên esasî ve girêdayî ne.

Careke din jî em dibînin di nava têkçûnên hemû plan û pirojên din ên di bin navê çareseriyê de, xeta sêyemîn isbat kir ew bijarteya serkeftî ya misogeriya hêvî û daxazên gelê Sûriyayê ye. Xeta nûnertiya çaerserî û aramiyê kir. Bi vê xetê re li pêşiya pêşketina pirojeyên xebata mezhebî û etnîkî hate girtin. JI ber xeta sêyemîn tam li gorî rewşa pirengî û dewlemeniya çandî ya civaka Sûriyayê ye.

5- Piştî 11 salan em dikarin bêjin di qada dîplomasî de çiqas gav hatine avêtin û gelo ev dikare ji bo naskirina Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê di qadên navdewletî de bibe zemîn?

Herêmên me îro bûne navenda serdana gelek aliyên fermî, saziyên civaka sivîl, perlemanter, xwediyên biryarê û saziêyn civakî yên cîhanê. Di sala 2022'an de pêşketinek mezin di çarçoveya pênasekirina Rêveberiya Xweser a demokratîk de çêbû. Hate destnîşankirin ku di nava hemû porjeyên Sûriyê yên bûn zemîna belavbûn, tevlihevî û kûrkirina aloziyê de pirojeya herî guncaw a çaerseriya aloziya Sûriyê ye. Di riya xebatên dîplomasî yên Rêveberiya Xweser de cîhanê rastî û wateya berxwedana gelê me û hewldanên me yên ber bi pêşxistina çareseriya demorkatîk a di Sûriyayê de nas kirin. Di encamê de îro nûnertiyên me li zêdeyî 8 welatên Ewropî û 5 li welatên ereban hatine vekirin. Ked û xebata hemû nûnertiyan jî dikevin xeta avakirina nêrîneke rast a derdora pirojeya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyayê de. Di vê çarçoveyê de heta niha gelek pêngav hatine avêtin; mebesta min di vir de xetên piştgiriya nêrîna Rêveberiya Xweser wekî pirojeyeke demokratîk di Sûriyê de ku aramî û hevgirtina civakî misoger dike ye.

6- Di dema gelê me pêşwaziya salvegera 11`an a şoreşa xwe dike, rêveberiya xweser mijara darizandina çeteyên DAIŞ`ê nîqaş dike, gelo bi darizandina çeteyên girtî wê rê li ber tu guhertinan veke?

Dadgehkirin beşek giring ji pêkanîna mafan e, di heman demê de pêwîstiyeke ji bo civaka navdewletî jî bikeve nava vê pirsgirêka mezin ku ne girêdayî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye. Dosya DAIŞ'ê giring û xetere jî, ji ber wê pêwîste civaka navdewletî di vê çarçoveyê de bi Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyayê re alîkar be. Dadgehkirin pêwîstiyeke û giring e. Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê zêdeyî gelek caran bang li tavahî cîhanê kir ku girtiyên DAIŞ'ê di dagehên navdewletî de werin darizandin, lê ew pêk nehat. Niha jî ji ber sedemên qanûnî ji bo lidarxistina dadgehê hene, pêwîstiyeke giringe. Bi taybet bi hebûna belge û daneyên guman di wan de nînin, ev hîn bi hêztir dike.

7-Neteweyên Yekbûyî jî di nav de heyanî niha hemû hewldanên çareseriyê xetimîne, li vê herêmê 11 sal in projeyên çareseriyê pêş dikevin, Rêveberiya Xweser nexşeriya çareseriya aloziya Sûriyê pêşkêş kir, di nêrîna we de gavên li vir di dawiyê de wê her kesî neçarî qebûlkirina vê xetê bike yan na?

Me berê behsa giringî û pêwsîtiya xeta sêyemîn kiriye û me gotiye ew tekane riya çareseriya demokratîk a aloziya Sûriyayê ye. Gelek piroje hebûn û hemû binketin û niha ji bilî pirojeya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku xeta çareseriya demokratîk û aramiya herêmê misoger dike li holê nînin. Pirojeyên heyî hemû têk çûn û nikarîbûn aramiyê pêk bînin. Em bi domdarî hewl didin vê nêrînê şîrove bikin. Em naxwazin nêrîn û baweriyên xwe li ser kesî feriz bikin, baweriya me ew e em her kesî bighînin baweriya xeta çareseriya aloziya Sûriyayê.

Di demekî de qaşo xwediyên pirojeyên çareseriyê tenê li pey desthiltdarî û bercewendiyên xwe diketin û hêza xwe nîşan didan û dûrî hêvî û pêwstiyên gelê Sûriyayê ketin.

Em ji bona pêşxistina pirojeya çareseriya rast di Sûriyê de kar û xebatê dikin û pirojeya me li ser erdê nûnertiya rastîn a pêkanîna çareseriya demokratîk a li ser xeta niştimanî dike. Gavên ku di salên derbasbûyî de pêk hatine jî van xalan nîşan didin. Me isbat kir ku di demekê de tu kesî nikarîbû pirojeyan pêşbixin, me pirojeya çareseriya demokratîk pêş xist.



# Şoreşa 19'ê Tîrmehê şoreşa rêxistinkirina civakê ye

Bi nêzîkbûna Şoreşa 19`ê Tîrmehê re, kar û xebatên TEV-DEM`ê û şêweyê sazbûyîna civakî li Rojava, bakur û rojhilatê Sûriyê têne meşandin. Girêdayî vê mijarê endamê Qordînasiyona TEV-DEM`ê Yûsiv Kûtê û Rêvebera Nivîsgeha Jinê ya Tevgera Civaka Demokratîk,Zeyneb Hesen dane zanîn ku kar û xebatên TEV-DEM`ê bûne bingha Şoreşa Rojava.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Tevgera Civaka Demokratîk,TEV-DEM`ê, li Rojava, herwiha bakur û rojhilatê Sûriyê bizaveke civakî, çandî rêxistinî û hwd… e. Hebûna vê tevger li Rojavayê Kuristanê weke mercekî bingehîn ji xwerêvebirin û pêşxistina milê xizmetguzarî, bîrwerî, xurtkirina têkiliyên civakî û çandî ye. Herwiha bilindkirina rewşa tendurstî, rêvebirina karê mafperestî, perwerdeyî ye.

TEV-DEM`ê bi destpêkirina Şoreşa Rojavayê Kurdistanê ya di sala 2011`an de hat damezrandin û bû destkeftiyek ji destkeftiyên şoreşa 19'Tîrmehê. Herwiha di destpêkê de tevgerê bingehê hemû komîn, partiyên siyasî û saziyên Rêveberiya Xweser ên di dema niha de, weke meclis, yekîtî, deste û hwd… ava kir. Tevahiya van saziyan jî girêdayî TEV-DEM`ê bûn, lê piştî damezrandina Rêveberiya Xweser di 2014`an de, ji sala 2017`an û bi şûn de piraniya wan ketin bin sîwana Rêveberiya Xweser. Piştî ku Rêveberiya Xweser hat damezrandin, TEV- DEM`ê xebatên ji bo pêşxistina hemû aliyên civakî, êdî bû li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê. Herwiha girêdayî xebatên civakî meşand û vê tevgerê, Saziya Civaka Sivîl li gundewarên Dêrazorê damezrand û li Tebqa, Minbic, Reqa Rêxistinên Civaka Sivîl jî da damezrandin.

Nêzî 30 sazî, yekîtî, deste û hwd li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê di bin sîwana Tevgera Civaka Demokratîk de cih digrin. Ev tevger bi giştî li ser karê rêxistinî, serpereştî û perwerdeya fikrî ya girêdayî xebata sazî, yekîtî û hwd… disekine.

Herwiha Yekîtiya Kedkarên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Yekîtiya Bazirganan, Yekîtiya Rewşenbîran û hwd girêdayî TEV-DEM`ê ne. Di heman demê de jî 8



**Yûsiv Kûtê**

nivîsgehên Tevgera Civaka Demokratîk yên li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê hene. Mînak li ser vê yekê; Nivîsgeha Perwerdeyê, ya Jinê, Nivîsgeha Ciwanan, ya Aboriyê û hwd.

Li gorî vê yekê hemû yekîtî, sazî û rêxistin di warê rêvebirinê de, li ser bingehê sîstema Hevserokatiyê kar û xebatê xwe dide meşandin. Meclsên sazî, yekîtî û şaxên wan jî hene. Hêjayî gotinê ye ku li bakur û rojhilatê Sûriyê jin jî cihê xwe di nava kar û xebatên TEV-DEM`ê de digre. Ji ber vê yekê mirov dikare bibêje ku Şoreşa 19`ê Tîrmehê şoreşa jinê ye û wê bi pêşengiya jinê biserbikeve.

Girêdayî kar û xebatên TEV-DEM`ê ji aliyê sazîbûyîna civakê ve, ji destpêka Şoreşa Rojavayê Kurdistanê heya niha endamê Qordînasiyona TEV-DEM`ê Yûsiv Kûtê û rêvebera Nivîsgeha Jinê ya Tevgera Civaka Demokratîk,Zeyneb Hesen ji Rojnameya Ronahî re axivîn.

**' TEV-DEM`ê bingeh Şoreşa Rojava danî '**

Kûtê da zanîn ku bi destpêkirina Şoreşa 19`ê Tîrmehê re, Tevgera Civaka Demokratîk gelek guhertin û veguhertinên bingehîn û giranbuha pêkanîn û wiha domand: "Dema alozya Sûriyê destpêkir, Rejîma Be`isê karê sazî û dezgehên bajarên Rojavayê Kurdistanê rawestandin. Me di wê demê de bi armanca sazbûyîn û rêxistinkirina civakê kar û xebatên biewle dane meşandin. Herwiha gava destpêkê ji avakirina komînê, meclis, partiyên siyasî ên hemû bajarên Rojava bû. Di heman demê de perwerdeyên fikrî yên xwerêvebirinê, civînên rêxistinî ji yekîneyên bingehîn ên civakê re çêkirin. Piştre bi dehan sazî, yekîtî û dezgehên mîna Yekîtiya Parêzeran, Meclisa Tenduristiyê û Yekîtiya Bazirganiyê hatin damezrandin. Herwiha damezirandina Yekîtiya Kedkarên Herêma Cizîrê xebata me ya yekemîn bû. Di heman demê de Tevgera Civake Demokratîk gelek sazî û yekîtî ava kirin û bingeha wan a rêxistinî danî.



Niha kesên ku girêdayî vê tevgerê ne hejmara wan bêtirî 300 hezar kesên sivîl in. Herwiha bi 10`an karmend, endam û hevserok hene tev jî xwe bixwe ji aliyê aborî bi rêve dibin û pêdiviyên xwe temam dikin "

**'Parastina Şoreşa 19'ê Tîrmehê erkê me yê bingehîn e'**

Endamê Qordînasiyona TEV-DEM`ê Yûsiv Kûtê diyar kir ku bi ked û xebatê destkeftiyên Rojava tên parastin û wiha axivî:"TEV-DEM`ê li kêleka Rêveberiya Xweser bi hemû karmend û kesên girêdayî xwe ji destpêka damezrandinê heya niha ji bo rêvebirin û pêşxistin û hemû karên girêdayî civaka sivîl bi awayekî rêk û pêk û da meşandin. Di heman demê de me bi Şoreşa 19'ê Tîrmehê re destkeftiyên giranbuha bidest xistin û bingeha Şoreşê ava kir. Li aliyekî din jî Rêveberiya Xweser jî bi hemû hêza xwe ji bo çakkirina rewşa civakî, xizmetguzarî, çandî, perwredeyî, ewlehî xebateke gelekî baş pêk anî. Li aliyekî din jî berdewamiya kar û xebatê ji bo civakeke rêxistinkirî û pêşketî, ked û xebat pêwîste. Ji ber ku kar û xebat bingeha parastina destkeftiyên Şoreşa 19`ê Tîrmehê ye, divê ked û xebata me raneweste. Bila erka rêvebirin û pêşxistina civakê tenê nekeve ser Rêveberiya Xweser û TEV-DEM`ê. Lê pêwîste ku di serî de ciwan û jin, civak tev erkê ku ji wan tê xwestin bi cih bînin. Ji ber ku jin û ciwan hêza bingehî ya avakirin û guhetina civakê ne.

**'Jin pêşenga şoreşa 19'ê Tîrmehê ye'**

Rêvebera Nivîsgeha Jinê ya Tevgera Civaka Demokratîk,Zeyneb Hesen da xuyakirin ku jinê li Rojava, bakur û rojhilatê Sûriyê ji tevahiya cîhanê re bûne çavkaniya hêzê û axaftina xwe wiha qedand:"Weke ku tê zanîn Şoreşa Rojava bi şoreşa jinê tê naskirin, jinên Rojava û bakur û rojhilatê Sûriyê di pêşveçûna vê şoreşê re xwe ji aliyê leşkerî, siyasî, aborî, civakî pêş xistin e. Jin cihê xwe di nav xebatên TEV-DEM`ê de ji destpêka şoreşê heya niha girtiye û weke pêşenga civakê di hemû kar û xebatan de cihê xwe digre. Di heman demê de jinên kedkar,



**Zeyneb Hesen**

endeziyar û mamoste tevlî tevahiya sazî, komele, yekîtî û hwd…bûn û bi vîn û xebata xwe Nivîsgeha Jinê jî damezirandin. Jinê di nava xebata tevgerê de bi fikrên azad, ji bo pêşxistin û rêxistinkirina civakê, gelek dewreyên perwerdekirina jinê û civakê pêşxistin û ji bona avakirina civakek azad her tim di nava kar û xebatê de ne. Ji bona pêşxistina civakê û jinê em her tim di nava kar û xebatê de ne û bi rengekî ber bi çav bandora vê yekê li hemû jinên bakur û rojhilatê sûriyê, heremê û tevahiya cîhanê dike. Şoreşa 19'ê Tîrmehê ya ku mîna şoreşa jinê tê naskirin bandoreke mezin li Rojhilata Navîn û tevahiya cîhanê kir. Herweha gelek jin ji gelek welatan bi şoreşê bandor bûn û berê xwe dane Rojava û tevlî şoreşê bûn û gelek ji wan jî şehî ketin. Di dawiyê de em Şoreşa19`ê Tîrmehê li hemû jinên bakur û rojhilatê Sûriyê pîroz dikin. Ji ber ku jina kurd ji bona jin û gelên cîhanê re bûn çavkaniya hêzê û sembola azadiyê."

## Pêwîste Şoreşa Rojava bê parastin



**Zekî Bedran**

Salvegera 11'emîn a Şoreşa Rojava maf dike ku bi gelek aliyên wê ve bê nirxandin. Dema li Rojhilata Navîn Bihara Gelan destpêkir, kesekî hesabê Şoreşa Rojava ya bi pêşengiya Kurdan nedikir. Gotin di cih de be Bihara Gelan veguherandin zivistanê. Di cewher de şoreşa gelan hat dizîn. Gel rabûn ser piyan lê ne bi rêxistinkirî bûn. Desthilatên herêmê û hêzên derve yên pişta xwe dabûnê bûn yek û şoreş vala derxistin. Dema ev serhildan li Sûriyê teyîsîn, taybet jî bi pêşengiya Tirkiyê gelê Sûriyê kişandin nava avgerekî. Hesab nekiribûn ku dê tenê Şoreşa Rojava ji vê avgerê xilas bibe. Lê tişta ku Tirkiyê jê ditirsiya pêk hat û Şoreşa Rojava weke Rokekî li Rojhilata Navîn biriqî. Tirkiyê, ji bo Rojava tesfiye bike piştgirî da hêzên weke DAIŞ û El-Qaîdeyê. Berê wan da Kurdan. Bi awayek zelal û vekirî destek da tevahî hêzên ku Îslam kirine amûrek a siyasî.

Li Rojhilata Navîn piştgiriyek mezin da Îxwaniyan û xerckirinek mezin çêkir.

Bi pêşengiya wan dê Erdogan xwe weke xelîfeyê cîhana Misilmanan îlan bikiribûya. Heta niha jî di cîhanê de yê herî zêde piştgirî da Erdogan bû. Dê bi destê Îxwanî û hêzên din ên muxalîf Beşar Esad ji desthilatdariyê bixistibûna û bi kesên hatibûna ser desthilatdariya Sûriyê xistibûna destê xwe. Yek ji sedemên ku evqas bi lez xwe berda nava Sûriyê, dijminahî û tirsa li dijî Kurdan bû. Gotin, şaştiya ku me li başûrê Kurdistanê kirî, pêwîste em li Sûriyê nekin, nehêlin Kurd sûdê ji derfetan bigirin. Ji bo Kurd nebin xwedî statû bi lez ketin tevgerê. Yek ji sedemên din jî digotin, ji xwe Esad nikare zêde li ber xwe bide, dê weke Qeddafî zû bikeve û em ê jî li Sûriyê bibandor bibin. Hesabek din ên wan ev bû.

Hesabên Tirkiyê pêk nehatin. Beşar dest jê berneda û neçû, cîhana Rojava jî ji bo çûyîna Beşar israr nekir. Piştî Îran û Rûsya jî ketin dewrê, B. Esad li ser lingan ma. Li aliyê din berxwedana Kurdan û hevkariya wan a bi koalîsyonê re DAIŞ bin xist. Ev jî bû sedema herî mezin a neketina rêveberiya Esad. Eger Kurdan li hemberî DAIŞ'ê li ber xwe nedabûya, DAIŞ jî bi hêzên din ên muxalîf re, bi piştgiriya Tirkiyê û hwd, dê berê xwe bidabûna Şamê. Jixwe şer gihiştibû taxên derdora Şamê.

Kurd li Sûriyê bûn hêza herî bibandor. Neketin nava hêzên muxalîf. Li kêleka rêveberiya Şamê jî cih negirtin. Vîna birêxistinkirina Şoreşê bikar anîn. Eger ev vîn derneketibûya holê, dê bûyerên li Sûriyê ber bi cihek cuda ve biçûbûna. Wê demê Kurdên ku bê pêşeng bimabûna, dê beşek wan bibûna alîgirên muxalefetê û beşek jî bibûna alîgirên rêveberiya Şamê. Ev yek jî dê bibûya sedemê encamên cuda. Di encamê de jî dîsa dê Kurdan winda bikirbûya û bibûna leşkerên hinekên din. Kurdan bi Şoreşa 19'ê Tîrmehê re pêvajoyek din dan destpêkirin û vê yekê hesab û hevsengiyên mezin ên li Sûriyê guherî.

Bi Şoreşa Rojava re herêm ji DAIŞ'ê hat paqijkirin. Ji ber ku hevkarî bi Koalîsyonê re hat çêkirin, tevahî Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji DAIŞ'ê hat paqijkirin. Dîsa bi helwesta siyasî ya xwe dispêre rêya sêyemîn a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê hat avakirin. Rêveberiyên Xweser tevahî gel, bawerî û çandên herêmê hembêz kirin. Li Rojhilata Navîn derî ji azadî û demokrasiyê re vekir. Ji derveyî xeta ku xwe dispêre cudakariya ol û nîjadî, yekîtiyeke ku xwe dispêre vîna azad û wekhev esas girt. Nîşanî gelên xwe kir ku di nava aşitiyê de bi hev re bijîn. Vê Şoreşê bala tevahî cîhanê kişand. Yek ji sedemên wê ewbû ku tevahî mirovahî ji belaya DAIŞ'ê xilas kir, a din jî pêkhatina şoreşa jinê bû.

Bakur û Rojhilatê Sûriyê, yanî xweseriya demokratîk îro di bin dorpêçek giran de ye. Dema Tirkiyê nekarî bi DAIŞ'ê û hêzên din Kurdan tesfiye bike, bi xwe dest bi dagirkeriyê kir. Li herêmên ku dagir kiriye paqijiya nîjadî kir. Sûcek nema ku li dijî mirovahiyê nekir. Dewleta Tirk bi hezaran hêzên çekdar ên ji ber DAIŞ'ê, El-Qaîde û hêzên din mane berhev kir. Van hêzan hem li dijî rêveberiya Şamê, hem jî ji bo tesfiyekirina Kurdan bikar tîne. Ev tevahî hêzên ku dijminên mirovahiyê ne, li herêmên di bin dagirkeriya dewleta Tirk de bi dilê xwe rêxistin dibin û di nava ewlehiyê de kar dikin. Îro Tirkiyê ji bo tevahî cîhanê veguheriye xeteriyekê, bûye welatek ku terorê vediguhêze cîhanê.

Di pêvajoya Astanayê de Tirkiyê, Rûsya, Îran û Sûriyê li dijî rêveberiya xweser bûn yek û ew ne rewa îlan kirin. Yanî li ser tesfiyekirina wê lihev kirin. Bi vî awayî dagirkeriya Tirk jî rewa dibe. Ji derveyî wê hikumeta Tirk hewl da li ser bingehê dijminahiya Kurdan xwesteka tevlîbûna Îsveç û Filandiyayê ya ji bo endamtiya NATO'yê bikar bîne. Tirkiye hewl dide li aliyekî Rûsyayê, li aliyê din DYE û NATO'yê bike hevkarê qirkirina li dijî Kurdan. Heta niha jî vê hewldana xwe didomîne.

Weke tê dîtin dixwazin Şoreşa Rojava ya ku li Rojhilata Navîn bû henaseyek bifetisînin. Diyar e ku şoreş di avên hêdî de nameşin. Ev kesayeta şoreşan e. Şoreş di avên bi pêl û bahozan de dimeşin. Niha yên ku rêça şoreşê di destê xwe de digirin, hêzên pêşeng neçarin ku di dervaya bi bahoz de keşitiyê bi awayek saxlem bigihînin bendergehê, pêwîste vîn û hostetiyê nîşan bidin.